Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (244) | Gulan / 1-5-2023

# Zêdetirî 40 rojan bi ser Komkujiya Cindirêsê re derbas dibin, malbatên şehîdan daxwaza mafê xwe dikin



**Kurdistan**

Şeva 20ê Adara 2023an li bajarokê Cindirêsê yê ser bi herêma Efrînê ve, hejmarek ji çekdarên grûpa Ceyş El-Şerqiye ji ber vêxistina agirê Newrozê, gulle li malbateke Kurd a bi navê (Pêşmerg) reşandin û di encamê de 3 bira û kurê birayekî şehîd bûn û 2 kes jî birîndar bûn. Piştî vê tawana hovane jî, karvedanên tund, nerazîbûn û xwepêşandanên berfireh li ser asta navxwe û derve derketin, tê de xwepêşanderan ev komkujî şermezar kirin, daxwaza dadgehkirina tawanbaran li dadgeheke navdewletî kirin, her wiha daxwaza derketina çekdaran ji nava gund û bajaran kirin û rêveberiya herêma Efrînê bo xelkê herêmê yê resen bê radestkirin.Piştî derbasbêna 40 rojan bi ser şehîdbûna wan ve, lê heta niha ti guhertin di dosya wan de nîne, malbata wan daxwaz ji aliyên peywendîdar û Neteweyên Yekgirtî dikin alîkariya wan bikin, û tawanbaran di zûtirîn dem de bighên sizayên wan, ew dibêjin tenê heta niha soz bi wan tê dayîn, lê ti soz nehatine cîbicîkirin.

**Normalkirina pêwendiyên ligel rejîma Esed** *Rûpel—2*

**Revandina zarokan berdewam e** *Rûpel—3*

**125 saliya Rojnamegeriya Kurdî** *Rûpel—4*

# Normalkirina pêwendiyên ligel rejîma Esed



**Kurdistan**

Naveroka civîna çaralî ya Tirkiye, Sûriye, Îran û Rûsyayê ya di asta wezîrên berevanî û serokên dezgeha îstixbaratê de eşkere dibe û ji aliyên civînê daxuyaniyên nakok tên belavkirin. Wezaretên bergiriyê yên Tirkiye û Rûsya di daxuyaniyên xwe yên di derheqê civîna Moskoyê de diyar dikin, wan pirsa asayîkirina pêwendiyên Enqere û Şamê gotûbêj kirine. Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê belav kir, Wezîrê Berevaniyê Sergey Şoygu bi her sê hevtayên xwe re mijarên bihêzkirina ewlehiyê li Sûriyê û têkoşîna li dijî terorê gotûbêj kirine û tekez kir ku di hevdîtinê de gavên piraktîkî ji asayîkirina pêwendiyên Sûriyê û Tirkiyê hatin gotûbêjkirin.Wezareta Berevaniyê ya Tirkiyê jî ragihand: “Di civînê de, bihêzkirina rewşa ewlehiya li Sûriyê, avêtina gavên berbiçav di warê asayîkirina pêwendiyên Tirkiye-Sûriyê de, têkoşîna li dijî her cure rêxistinên terorîst û komên tundrew li Sûriyê û xurtkirina xebatên ji bo vegerandina penaberên Sûriyê bo warên xwe, hatin gotûbêjkirin.”Wekî Tirkiye û Rûsyayê, Wezîrê Berevaniyê yê Îranê Mihemed Riza Aştiyanî jî eşkere kir, rojeva sereke ya danûstandinên wan, asayîkirina pêwendiyên Enqere û Şamê bûye û ew digel Rûsyayê ji bo vê armancê hemû hewlên xwe didin. Aştiyanî her wiha diyar dike jî, ew dixwazin êdî di navbera Tirkiye û Sûriyê de danûstandineke rasterast çêbibe. Lê Wezareta Berevaniyê ya Sûriyê daxuyaniya van her sê welatan red dike û dide zanîn ku rojeva wan a sereke, ne asayîkirina pêwendiyên digel Tirkiyê bûye. Wan di civînê de vekişandina leşkerên Tirkiyê ji nava xaka Sûriyê gotûbêj kirine.
Ji aliyekî din ve jî, jêderekî sûrî ji rojnameya “Al-Watan” a Sûrî re tekez kir ku vekişîna Tirkiyê ji nav axa Sûriyê, mijara yekem e ku divê di gotûbêjên civînên asayîbûnê de were çareserkirin.Şam her çend e li ser vekişîna leşkerên Tirkiyê rijd be, Enqere jî li ser mana xwe ya li Sûriyê rijd e û Wezîrê Derve yê Tirkiyê Mewlût Çavûşoglu rojek beriya civîna Moskoyayê tekez kiribû, vekişîna wan a ji Sûriyê li ser mayîndebûna dewleta wan metirsî ye, ji ber wê jî ew ji Sûriyê vanakişin.Wezareta Derve ya Amerîka pêşwazî li şandeke Desteya Danûstandkar a Opozîsyonê Sûriyê kir û tekezî li ser wê yekê kir ku siyasta Amerîka derbarê Sûriyê de nehatiye guhartin û ew li dijî asayîkirina pêwendiyan bi rêjîma Beşar Esed re ne.Beşa Karûbarên Rojhilata Nêzîk di Wezareta Derve ya Amerîka de 26ê Nîsana 2023an li hejmara xwe ya tora civakî “Twitter” belav kir, Cîgira Wezîrê Derve ya Amerîka Barbara Leaf pêşwazî li şandeke Desteya Danûstandkar a opozîsyona Sûriyê kir. Diyar kir jî, aliyê Amerîkî di civînê de tekezî li ser wê yekê kiriye, siyaseta wê derbarê Sûriyê de nehatiye guhartin, ji ber nebûna guhertinên siyasî yên herdemî û piştgiriyek bihêz ji biryara Encûmena Asayişa Navdewletî 2254 re di nav de jî rola opozîsyona Sûriyê, ti pêwendî bi rêjîma Esed re nayê asayîkirin.Şanda Desteya Danûstandkar duhî sêşemê 25ê Nîsanê bi serokatiya Serokê Desteya Danûstandkar Bedir Camûs endametiya Serokê Hevpeymaniya Opozîyonê Salim El-Muslet, nûnera serbixwe Fedwa El-Icêlî û Nûnerê ENKSê di opozîsyona Sûriyê de Îbrahîm Biro gihîştibû Washingtonê. Ji aliyê xwe ve, Bedir Camûs piştî hevdîtina bi Barbara Leaf re diyar kir, wan di civînê de tekez kir li ser wê yekê kirin ku her çareseriyeke siyasî li Sûriyê, divê li gor biryarên Encûmena Ewlekariyê be, nemaze biryara 2254, her wiha nebûna çareseriya siyasî û cibicînekirina qonaxa veguhêz, dê trajediya gelê Sûriyê zêdetir bike.
Cîgirê Berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê Vedant Patel radigihîne, Amerîka di wê baweriyê de ye ku Sûriye ne hêjayî ye ku di nava Komkara Erebî de bê qebûlkirin.
Di konferanseke rojnamevanî de got: “Em di wê baweriyê de ne ku Sûriye ne hêjayî ye ku di nava Komkara Erebî de bê qebûlkirin.”Patel diyar kir, ji ber nebûna “pêşveçûneke rasteqîn” ji bo çareserkirina aloziya li Sûriyê, Amerîka pêwendiyên xwe bi hikûmeta Esed re asayî nake.Berdevkê Amerîkî her wiha got, Amerîka ji hevkarên xwe yên herêmî yên ku bi asayîkirina pêwendiyên hikûmeta Sûriyê re mijûl in re piştrast dike ku divê baldariya wan li baştirkirina şert û mercên mirovî li Sûriyê be. Ev daxuyaniya Patel di demekê de ye, di dema dawî de nîşanên vebûna ereban li hember Sûriyê diyar dibin, Wezîrê Derve yê Sûriyê Feysel Miqdad di çend rojên borî de serdana Siûdiye, Misir, Cezayir û Tunisê kiribû, şarezayên siyasî jî dibêjin, ev serdana di çarçoveya vegerandin û asayîkirina pêwendiyên di navbera welatên erebî de ye.



# Kurdên li Sûdanê daxwaza alîkariyê dikin



Ji ber şer û aloziyên navxwe yên Sûdanê, Kurdên nişteciyên Sûdanê ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Dezgeha Xêxwaziya Barzanî daxwaza alîkariyê dikin.
Di daxuyaniyekê, Kurdên nişteciyên Sûdanê diyar dikin ku zêdetirî 200 malbatên Kurdên Rojavayê Kurdistanê ku xelkê navçeyên Girê Spî, Serê Kaniyê, Efrîn û Kobanê ne, ji ber şer û aloziyan li Sûdanê asê mane. Di daxuyaniyê de Kurdên Rojavayê Kurdistanê, ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî û Parêzgariya Hewlêrê daxwaz dikin ku di rewşên awarte de her dem li cem Kurdan rawestiyane û alîkarî û piştevanî pêşkêşî wan kirine û alîkariya wan jî bikin û wan di demeke herî nêz de ji Sûdanê rizgar bikin.
Roja 15ê Nîsana 2023an, li Xertûma paytexta Sûdanê û çendîn bajarên din, di navbera Artêşa Sûdanê û Hêzên Piştevaniya Bilez de şer û pevçûn dest pê kirin. Li gor amarên herî dawî, heta niha nêzîkî 450 kes li navçeyên cuda cuda yên Sûdanê hatine kuştin, lê belê rêxistinên ser bi Neteweyên Yekgirtî tekezî li ser wê yekê dikin ku rewşa mirovî ya li Sûdanê xirab e û hejmara qurbaniyan jî ji vê hejmara ragihandî, zêdetir e.

# Kuştin û işkenceya welatiyên Sûrî li ser sînorê Tirkiyê

**Kurdistan**


Rêxistina Human Rights Watch (HRW) radigihîne, pasewanên sînor ên Tirkiyê bi awayekî bêserûber welatiyên sûrî yên ku hewl didin sînor derbas bikin, eşkence didin û dikujin. Her wiha bang li Enqerê kir jî, lêkolînê li ser van binpêkirinan bike û wan ceza bike.
Rêxistina HRW 27ê Nîsana 2023an di raporekê de diyar kir, "pasewanên sînor ên Tirkiyê bi awayekî bêserûber gule li sivîlên Sûriyê yên li



ser sînorê Sûriyê reşandine û eşkence didin û hêzeke zêde li dijî penaxwaz û koçberên ku dixwazin derbasî Tirkiyê bibin, bikar tînin."Got jî: "Hikûmeta Tirkiyê divê lêkolîneke di vê derbarê de veke û pasewanên sînor ên ku ev binpêkirinên mezin ên mafên mirovan kirine ceza bike."Li gorî HRW, roja 11ê Adarê pasewanên sînor ên Tirkiyê bi awayekî hovane li komek ji 8 welatiyên Sûriyê da ku dixwestin bi awayekî neyasayî derbasî Tirkiyê bibin, di encamê de kesek û ciwanek di bin çavan de canê xwe ji dest dan û yên din jî bi giranî birîndar bûn. Roja 13ê Adarê jî, pasewanekî sînorî welatiyekî sûrî yê 59 salî dema ku erdê xwe li nêzîkî sînor dajot, gulebaran kir û ew kuşt.Ji destpêka sala 2023an ve, Rewangeha Sûrî bo Mafên Mirov, 12 haletên kuştinê û 20 haletên birîndarbûna li ser destên pasewanên sînorê Tirkiyê hatine kirine, tomar kirine. Rêvebirê HRW yê Ewropa û Asyaya Navîn Hugh Williamson got: "Haletên kuştinê yên bi awayekî hovane ji aliyê pasewanên sînorî yên Tirkiyê ve hatine kirin, bêyî ku hikûmeta Tirkiyê bi awayekî bibandor rûbirûyî wan bibe yan lêkolînê derbarê wan de bike ku ji sala 2015an ve bi sedan sûrî hatine kuştin."
HRW di rapora xwe de got, ji mafê Tirkiyê ye sînorên xwe biparêze, lê divê di çarçoveya hiqûqa navdewletî û mafên mirovan de be.

# Revandina zarokan berdewam e

Li bajarê Munbicê yê gundewarê Helebê ku di bin destê hêzên Sûriya Demoqratîde ye, HSDê zarokek revand. Mihemed Nûr Ibrahîm zarokê 13 salî ji 24ê meha Nîsana 2023yan ve bo leşkeriya neçar hatiye revandin. Ew zarok ji Munbic hatiye revandin temenê wî 13 sal in. Tevî hewlên malbatê bo zanîna çarenivîsa wî lê bê sûd in. Li bajarê Hesekê yê Kurdistana Sûriyê, hêzên Sûriya Demoqratîk zarokek revand.
Emced Ebdulrezaq Eltaha zarokê 13 salî ji duh ve 21 meha Nîsana 2023yan ve hatiye revandin.
Li gorî agahiyan zarok ji taxa Elkelasê yê Hesekê hatiye revandin temenê wî 13 sal in.
Tevî hewlên malbatê bo zanîna çarenivîsa wî lê bê sûd in.
Ji dema ku PYD destheladarî ji rêjîma Sûriyê li Kurdistana Sûriyê wergirtiye her dem zarokên kurd direvîne, ta niha bi dehê hezaran bo rizgarkirina bajarên erebî kirine qurbanî.



# 125 saliya Rojnamegeriya Kurdî




22ê Nîsanê Roja Rojnamegerîya Kurdî ye. Di sala 1898an de wate 125 sal beriya niha li paytexta Misirê Qahîreyê, rewşenbîrê Kurd Miqdat Midhet Bedirxan rojanemya bi navê “Kurdistan” derxist. 22.04.2023, hevdem li gel derketina yekemîn hejmara Rojnameya Kurdistanê ku 125 sal di ser wê rojê re derbas bûn.

22ê Nîsanê Roja Rojnamegeriya Kurdî ye, ji ber ku “Rojnameya Kurdistan” rojek wekî îro dest bi weşanê kir. 125 sal berê ango di sala 1898an de Miqdad Mîthad Bedirxan cara yekemîn li Paytexta Misir bajarê Qahîreyê rojnameyeke Kurdî ya bi navê “Kurdistan” derxist. Rojnameya Kurdistanê li ser hev 31 hejmar çapkirin. Miqdat Midhet Bedirxan 5 hejmarên pêşîn derxist, lê ji ber zordestiya dewleta Osmanî, Miqdat Midhet Bedirxan nekarî rojnameyê berdewam bike. Ji ber wê birayê wî Ebdurrehman Bedirxan dest bi derxistina rojnameya Kurdistanê kir. Hejmarên yekemîn heta 5emîn li Qahîreyê, 6emînê heta 19emîn li bajarê Cinêv a Swîsreyê, 20emîn heta 23emîn careke din li Qahîreyê, hejmara 24ê li Londonê, 25ê heta 29ê li Îngilistanê û hejmarên 30 û 31ê jî dîsa li Cinêvê hate çapkirin û weşandin. Piştî rojnameya Kurdistan bi rêzê rojnameyên Şark û Kurdistan, Amîd-î Sevda, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Yekbûn û Kovara Jîn û herwiha rojnameyên bi navê Kurdistan û Jîn hatine çapkirin. 75 salan piştî derketina rojnameya Kurdistanê, di 1973an de li Başûrê Kurdistana, 22ê Nîsanê wek “Roja Rojnamegerîya Kurdî” hat destnîşankirin û ji wê rojê ve her sal ev roj tê pîrozkirin. Ji roja ku rojnameya Kurdistanê derketiye heta îro bi hezaran rojname û kovarên Kurdî derketine.

# Êş û azarên Cindirêsê li ser kavilan

Ev wêneyên hejmareke tabloyên şêwekariyê ne ku ji aliyê hejmareke şêwekarên bajarê Efrînê ve hatine nexşandin, û li ser kavilên wêrankirî yên Cindirêsê hatine danîn.







# Wa Keyxisro



Azad Haco Hemê

Mi helbestek nivîsandiye liser êş û kêşeke me kurda pirr ne xweş û ne hez ku ew jî pirr bûna partiyên me ne yê li me û dozê bûne emel helbesta min bi navnîşana ( Wa Keyxisro) Keyxisro Kawayê hesinkare
Wa Keyxisro serî hilde wer rewşa me bişopîne
Li miletê me pirr bûn partî yek a dinê qet nabîne
Çav soriyê lihev dikin her yek begem xwe dibîne
Milet maya jar û feqîr her der welat bi axîne
Doz berdane ji wanr ne xeme bitenê mifa lêgerîne
Pak û paqij bi dûr dixin da meydan bi wan bimîne
Her ku xweda derfet dide çavê me ronî bibîne
Her kes dibe zirrt û serkêş dozê sed sal paş dixîne
Were gewrem bo wan bêje du galgalên bi beyanî
Çawa mîdiya hat afirî li duniyayê imbratorî
Mîna min û ristemê zal bo mîdiyan can bi gorî
Ev du hezar û şesid sal çima nakin jime serborî